
Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.


Osman Sebrî
1905 - 1993


*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar (158) Sal 28 01 Mijdar 2023 z - 2635 k Êmêl : Newroz@yek-dem.net Buha (100)L.S

# Her Sal û Dem Hêvî Lidar În!










## Desteya sernivîser

Ji sala 2011-an ve, agirê şer, li devera Rojhilata navîn û Bakurê Afrîkayê dilîze, hişk û ter dide ber xwe, dişewitîne, arî, mirin û malwêraniyê li şûn xwe dihêle! Paşê, çirûskên êgir gihiştin Rojhilatê Ewropa û Okrayîna jî bûn qurban, û li vê dawiyê, agir gihaye Xeza Filestînê, û her diçe rivîna agirê şer û bêhna mirinê bilindtir û berfirehtir dibe!

Bêgoman e ku ev şer, ne xweber û bê pilan pêdikevin, ji ber ku li dirêjahiya dîroka mirovahiyê, û îro jî wiha ye, li kîjan devera cîhanê şerekî mezin derdikeve, destin veşartî li pişt hene, ew bi têvedan û pilana hin aliyan dibe, ew aliyên ku ji bo pêkanîna berjewendiyên xwe, dikarin bi milyonan mirovan bidin kuştin û bi sedan bajaran kavil û wêran bikin, mirovan bê cih û war bihêlin!

Wekî ji mêj ve Kurdan gotiye: «Xeta xwar, ji gayê pîr e!», ango ji gayê xwedî hêz e, wisa jî ev şerên ku li cîhanê rû didin, hemû bi destê dewletên .....

2

## Konfiransa SFPZK/Şaxê Ewrupa hate lidarxistin

Konfiransa SFPZK - Şaxê Ewrupa, di 19.08.2023yan de li bajarê Bremen- Almanyayê, û bi beşdariya hejmareke hêja ji mamoste û zimanhezên zimanê Kurdî ji hundir û derveyî Almanyayê hate lidarxistin.

Li destpêkê, Baranê Cûmê bixêrhatina mamoste û mêvanan kir û konfirans bi xuleke bêdeng li ser giyanê pakrewanên Kurd û Kurdistanê bi giştî û bi taybetî li ser giyanê kesên ku di ber zimanê Kurdî de ked û cefa dîtibûn dest pê kir. .....

5

## Şahiya 78'emîn Salvegera Damezirandina PDKÎ, li Frenkfortê Pêk Hat

Bi boneya 78'emîn salvegera damezirandina Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, îro 26.08.2023 li bajarê Frankfurt, Almaniyayê şahiyek bi amadebûna hejmareke mezin ji heval û dostên wê partiyê bi rê ve çû.

Li ser vexwendina komîta Almanya ya partiya bira, şandek ji hevalên Partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê beşdar bû.

Gelek axaftin hatin kirin û gelek peyam û telegrafên pîrozbahiyê ji rêveberiya pîrozbahiyê re hatin şandin, yek jê Peyama Navça Ewropa ya P.Y.D.K.S bi Zimanê Kurdî hat şandin, va ye ew peyam:

**Peyam**

***Bo Partîya Demokrat a Kurdistana Îranê – Komîta Almanya.***

**Hevalên** .....

6

# Aboriya Sûriyê berî û piştî kirîzê!

**Nazdar Hesen**

Aboriya Sûriyê berî xwepîşandanên gelêrî di Avdara 2011an de û destpêka kirîza wê, di nav aboriyên herî cihêreng ên welatên pêşketî û pêşveçûyî de bû; ji sedî 75 ta 85 xwarin, derman, cil û pêlavên xwe berhem dikir û yên zêde difrotin bêtir ji 60 dewletan; û berhema nefta Sûriyê rojane ji pêwîstiya bazarê xwe zêdetir bû, û rojane ew nêzîkî 150 hezar bermîl dihat hinardekirin; di berê pembû û xwedîkirina pez û dewaran de jî ew di nav pêşîn pênc welatên ên Cîhanê de bû, hilberîna wê ya genim jî, pir salan ji gerekiya bazarên xwe yê navxweyî zêdetir dida. Ji aliyekî din ve jî, lîreya Sûrî bi nirx bû, û yek dolar bi kêmî 50 lîreyan bû; û mûçeyên mehane jî di navber 300 ta 600 dolarî de bû. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin aboriya Sûriyê û rewşa jiyanê rojane berî kirîzê baş bû, û tevî nesaxî û ne dadmendiya dewletê di belavkirina xêr û bêrên welêt li gelê xwe de, û tevî gendeliya di saziyên wê de, pêdiviyên bingehîn û xizmetguzariyên wek nan, şekir, birinc, çavkaniyên enerjiyê, derman, perwerde û xwendin berdest, erzan an bê biha bûn, ew jî bûbû egera ku asta hejarî û belengaziyê di wê demê de ne ewqas bilind be.

Lê zor mixabin, bi berdewamiya kirîzê û şerekî wêranker, gurtirbûna gendeliyê di saziyên



hukûmetê de, bandora komên şerxwazan, tundkirina dorpêçên Rojava, encamên koronayê, ziwabûn û derketina samanên bingehîn ji bin kontrola dewleta Sûriyê, aboriya Sûriyê rastî ziyanên giran hat û rewş her çû xirabtir kir, û vê yekê nirxê lîreya Sûrî pir daxist, ta ku vê dawiyê nirxê wê giha dolarek bi 14 hezar lîreyan be, û mûçeyê mehane yê karmendên nêzî 10 ta 20 dolaran be û yê ku bihabûna hemû tiştan re bibe tenê mezaxta rojekê an diduyan e.

Ji ber bûhabûna hema bê kontirol û daketina nirxê lîreya Sûrî, piraniya gelê Sûriyê niha di bin sînorê hejariyê de dijîn, û Bêguman, ev jî bi xwe re metirsiyên pir mezin tîne holê. Ji ber vê jî, zor pêwîst e ku di zûtirîn dem de ev kêşeya rûdayî were kontrolkirin û çareseriyên guncaw werin dîtin.

---

**Her Sal ... Dûmahîk**

mezin ên xwedî biryar dibin. Nakokiyên aborî û siyasî yên di navbera wan de derketine, hiştine ku rêxistina navdewletî (UN) sifîl û kêmrol bibe, serberdayetî di têkilî û peywendiyên navnetewî de çêbibe, yasa ji civaka navdewletî rabe, aşîtî û hêminî jî winda bibin! Herwiha, eger aqilmend, pispor, fîlosof û aştîxwazên cîhanê bi lez li ser vê pirsê ranewestin, çarenûsa mirovahiyê ji destên bazirganên şer rizgar nekin, paşeroja cîhanê ber bi tarîtî û şerekî wêran ve diçe ku, hemû gel dê baca wê ya giran bidin!

Ji ber vî şerê dirêj û dijwar ku pêçên aliyên herêmê û yên derve têde diyar û aşkere ne, welatê me Sûriyê tarûmar bûye, kavil û parçe parçe bûye, aboriya wî lawaz bûye û perîşanî û hejariyê stoyê welatiyên wî xwar kiriye.

Dewletên herêmê, nemaze Turkiya û Îran, di vî şerî de xwedî rol û bandoreke mezin in. yek ji wan bi rijêmê, û ya din jî qaşo bi rikberiyê re ne, lê di rastiyê de, ew herdu li berjewendiyên xwe bi tenê digerin, jehra kîn, zikreşî û berberiyê di civakê de belav dikin û rondikên derewîn li ser rewşa gelê Sûriyê dibarînin!

Turkiyê, Bakur-Rojavayê Sûriyê û gelek deverên Kurdî mîna Efrîn, Girê Sipî û Serê kaniyê dagîr kirine, hemû saman, xêr û bêra wan didize, dibe, pirojeya guhertina dêmografîk li deverên Kurdî pêk tîne, dijayetî û tunekirina Kurdan, ji xwe re kiriye stratîjîk û armanca sereke, û li behaneyekê digere ku di vê mij û moranê de Kurdan bêşîne, wan kûr birîndar bike. Di vê çarçoveyê de, beriya demekê, me dît bê bi çi hovîtiyê navendên av û kehrebê, nexweşxane û navendên asayişê li deverên Kurdî şewitandin û xelkên me di tariyê de hiştin, bê ku tu alî destên xwe bidin ber vê bêdadî û zordestiya dewleta Turkiyê.

Her diçe, rewşa welatê me û deverê aloztir dibe, tevgera me ya siyasî ji ber hev dikeve, asoyên çareseriyê xuya nakin, gelê me penaber dibe û derd û xemên giran dikişîne; lê, ew bi hêvî ye ku rojek were, ew jî mîna gelên cîhanê, li ser xaka bav û bapîran serbest û azad bijî, û ji bo wê armancê jî, têdikoşe, kar û xebata wî ranaweste!

# Neyar dûv li hev digerînin


**Zamdarê Zindî**

Tiştekî pir xwazaye ku her aliyên di Sûriyê de û pirojeyên xwe ne wek hev in, ji ber sûd û berjewendiyên xwe ve bixebitin û ji hev re astengiyan çêbikin û ser rêyln hev zinaran tolkin ta ku bikevin û bilukumin. Lê tiştê ne xwaza ew e ku piraniya aliyan xwe bi hêzên derve hilpesartine û nûsa pêve girêdane û di qasnaqa wan de digerin. Wek nimûne hêzên Îslamî û tunderew û terorist, çi Îxwan mislmîn, Heyet tehrîr Şam û Da›iş…Bi tirkiyê û Qeterê ve girêdayî ne û li gor nêrînên wan dilivin û doza avakirin dewletek îslamî kevin dikin. Li aliyên din hemî refên îslamî û şî›î digel rijîma heyî bi Îranê ve girêdayî digel anîna dewleta rûsî bi hêzên leşkerî. Pirojeya van jî hêştina rijîmê bi rewşa xwe di hemî waran de wek berê be. Van herdu aliyan tindrew çi Sinî an jî Şî›î li seranserî cîhanê komkirin li nav garisê gelê Sûrî şer kirin û hêj dikin, bûn sersedema hilweşandina Sûriyê aborî, avahî, awarekirin çi li hindir û çi li derve û ji hev dûrxistina derûnî û rewşenbîrî, wek welat sedemên hevjiyana hevbeş nehêlin. Ev herdu alî wek hêzên reş û tarî bi navbike ji ber ku nûjenkirina jiyanê di hemî waran de di ferhenga wan de tun ye.

Li rexê din jî pirojeya niştimanî ya nûkirin û demokratkirina Sûriyê li ser destê Mesedê û hêza xwe ya leşkerî Qesedê hate hildan û bi piştgiriya hevbendiya navdewletî çi leşkerî û çi jî piroja konevanî. Îro herdu piroje (pirojeya guhartina Sûriyê û pirojeya paşhêştina Sûriyê) digel dostên her aliyekî li orta hev dikevin. Bi gotinek din neyarên nûkirina Sûriyê dûv li hev digerînin û alîkariya hev dikin ku kanibin pirojeya nûkirin û demokratkirina Sûriyê bişkînin û berbavê, ger nebû jî rêyê li ber aloz bikin.

Ev kar û destêwerdan wê berdewam bikin, ta rewşa Sûriyê ji bin ve neyê çareserkirin û tiştên hevbeş di destûra nûjenkirina Sûriyê de cihên xwe negrin. Rewşê wek niha û xerabtir jî wê berdewam bike, û alozî wê mezin û girantir bibin û xwîna gelê sûrî tim biherike!

Hemî aliyên nakokîdar geliş û nakokên xwe dane alîkî, û berê xwe dane şkandina pirojeya Mesedê û Qesedê, ku kanibin wan ji holê rakin, paşiyê werin Sûriya hilweşandî li hev parve bikin. Ta roja îro tu alî bi serketî tune ne, hersê tekên mîzînê li tenga hev in, ji ber rewşa hersê dewletan (Rûsiya, Îran, Turkiyê) berjewendiyên xwe nêzîk hev in zû-zû nikarin xwe li ortê hev xînin û bûne hêzên dagîrker li ser axa Sûriyê.




Turkyê, Îran û rijîm bi sertî li dijî mafê gelê Kurd in. Tiştê hevpişk di navbera wan hersê aliyan de ew e ku gelê kurd li hemî perçan bê maf bikin, ji bona ku hemî xêr û bêra kurdistanê çi yên bin erdê û çi jî yên ser erdê ji wan aliyan re diçin, ji ber wê di tenga dijîtiya Kurdan re ew yek in.

Li van rojên dawî hemî aliyên bi hev re nakok û pêwendîdar hemî gelişên xwe dane alîkî hemî destikên xwe li gor şaşî û kêmaniyên Qesedê û xweseriya rojhiltî Ferêt livandin ku çi ziyanê di hemî waran de bi rojhilatî Ferêt gihînin. Deftera hemî aliyên li dijî Mesede bi tewanan zengîn in. Berî vê bi demakê bûyera girtîgeha sinae›e bû, û êrişên rojan ên rêxistna Da›iş berdewame, wê hêj jî pir kort û feqan li ser rêya Qesed bikolin û vegrin. Lê wek bûyer girtîgeha Sînae›i wê berbavê û bişkê. Ev di vê demê de xwestin ku van bilivînin, ji bo di aliyê ragihandinê de çavan li ser bûyerên li Suwêda dibin ji xwepêşandin û li herêm din doza şkandina rijîmê dikin bi ber rojhilatî Ferêt bibin. Ji ber ku ramana xweseriya li ba xelkê Swêdayê jî cihê xwe digre weke Kurdan wê dixwezin.

Li gor tabloya konevanî, aborî, leşkerî, zemîngarî û civakî. Hêza Mesedê û Qesedê gerek bibin hêzek hukardar, pirtirî hukariya aliyê din lê bibin. Li gor xalên di destan de

* Zemîngariya di bin destan de 30% ji rûpîvana Sûriyê ye.

* Hejmara niştciyan ne kêmtirî herdu herêmên di bin destê rijîmê û û Tirkan de ye. *Hema Qesedê serdest cihê aboriyê ye, piraniya girseya aborî, xêr û bêra sererd û çi xêr û bêra binerdê. Kane pir girêkên xwe pê ji hev veke.

*Avahiya Qesedê ji pêkhateyên xelkê wê herêmê ne, hemî li gor rajeya hebûna xwe di hemî dezgezge û saziyan de cihê xwe girtine û herêmên xwe birêve dibin. Ango tevahiya gelê sûrî tê de hene, ne bes ji pêkhateyekê ne.

* Pirojeya xwe ya konevanî, mafê hemî pêkhateyên sûrî dinimûne. Doza Sûryek ne

..... 4

# Nivîskarê bê Welat



**Kalê Maratê**

Di dema bindestiyê de nivîskarekî Kurd çiqasî pirtûkên hêja û serketî binivîse jî, nagihêje heqê xwe, ji ber ku pişta wî kul e ji ber ku pergal û hêza wî ya dewletî tune ye, nivîskarek karê wî ew e ku pirtûkeke baş binivîse, û jê pê ve êdî ne di destê wî de ye. Qedera pirtûkeke piştî nivîskar wê diweşîne, êdî dikare dest faktorên derve heke tu bindest û bê welat bî û zimanê te hîn nebûbe zimanê fermî, pirtûka te çiqasî hêja be jî, wê pir kêm were xwendin. Lê, eger tu xwedî welat bî û zimanê te li tevaya cîhanê berbelav be, wê hîngê pirtûka te çiqasî qels be jî, wê pir were xwendin.

Rewşa nivîskarê Kurd û ya nivîskarên miletên din pir ji hev cuda ne. Mercên wî pir dijwar in, ji bo wî gundek heye kûçikên xwe giş berdane û kevirên xwe giş girê dane. Di van şert û mercên newekheviyê de, ji nivîskarê Kurd tê xwestin ku bi nivîskarên serdset re pozberiyê bike. Vêga ne xwedê qebûl dike ne jî şeytan. Lê, di van şert û mercên gelekî dijwar de jî, nivîskarên Kurd nivîskarên talanker ji nav civaka xwe qewirandin û wêjeyeke modern afirandin, bêyî ku siyaseta Kurdan û aboriya (dewlemendên)Kkurdan alîkariya wan bike jî; wan ev kir heke mirov tevî hemû bêderfetiyan dîsa jî karibe bi zimanê xwe stran, helbest û çîrokên xwe bêje, ev hêzeke mezin e.

Nivîskarên Kurd navbarî û hêzdariya serdestiyê hilnebijartin, lêbelê wan hebûna xwe hilbijart ji ber ku xwebûn ji navdariyê hêjatir e. Berhemên kurmancî li dinyayê belav nabin ne têne wergerandin bo zimanên din, û ne jî têne xwendin. Ev ne ji ber hemû pirtûkên Kurmancî xerab in û wêjeyeke Kurmancî tune ye, wiha ye lê ji ber ku dewletek Kurdan tune ye wiha ye. Pirtûkeke bi desthilatdarî û aborîya kul pişta wê ya ziman e ya jî mezin xuya dike. Vê gavê piyaseya dinyayê ev çend kirêt e ku nivîskarek pênûsa wî çiqasî xurt be jî, ger welat û desthilatdariyeke wî tune be, ew jî tune tê hesibandin; ne ew tê naskirin ne jî tê xwendin; li dinyayê nivîskar piştî radeyekê êdî ne di destê wî de ye, bifire jî vala ye.

Îro ro, li dinyayê ya tê xwendin ne pirtûk e, welat e! Îro ro, li dinyayê polîtîka û wêje bûne cêwîkên hev, ev tiştekî çewt e. Polîtîka û wêje caran a jî (heke nivîskar bê piştgiriya welatekî li dinyayê belav bibe, wê çaxê wê dinya wêjeya rast bibine. Lê heke nivîskarek bi welatekî mezin bibe ev nezimbûneke derewîn e) bo azadiyê dikarin di navbera wan de hevkarî hebe, lê taliya talî, her yek bi serê xwe kesayetek e. Wêje û huner ne xulamên welat û siyasetê ne, ya jî ne mehkûmên wê ne.

Şikespîr nivîskarekî baş e, lê heke li pişta wî welatên wek Amerîka û Birîtanya tune bûna, Şikespîrê nedibû Şkespîr. Ev nayê wê wateyê ku Şikespîr nedibû Şikespîrê pênûseke xerab e û ne behremend e; lê belê, gelek nivîskarên din ên biqasî Şikespîr baş hene wek Ehmedê Xanî, lê haya kesî ji wan tune ye. Helbet ev ne sûcê Ehmedê Xanî ye û ne .....

5

**Neyr dûv... Dûmahîk**

navendî, gava pêk were, daxwaze dilê her pêkhatek sûrî ye û mafê xwe tê de dibîne, û ji bona hemî pirsên Sûriyê yên konevanî ew çareserî ye.

*Hêza xwe ya leşkerî (Qesedê) çi di aliyê hejmarê der de û çi jî hêla çekên pêşketî de û perwerda leşkerî de, ne kêmtirî hêzên din ên hene ye.

*Dostên xwe yên li cîhanê yên herî bi hêz in. Hevbendiya navdewletî ew dostê Qesedê ne, û hejmarek ne hindik ji dewletên Ereban jî dostên wê ne.

*Li rex xalên me hejmartine, bi qaser wan hemiyan giring heye. Ew jî ku ev hêza leşkerî û sîwana xwe konevanî Mesedê karibin herdem xwe peşkin nû bikin û xwe ji hindire ve peş bikin biguhêrin. Ango kesên berpirsiyar ger şaşî kirin zû werin dan yan, û kesên ne li gor cihê tê de werin guhartin ew jî di rêya sazî, dibistan û akadîmî ava bibin û şarezayan peyda bikin berpirsiyar û sereke ew jî sûrî bin.

*Divê jiyana demokrasiyê di vê herêmê de bibe çira û ronahiya xwe ya konevanî, nirxdan merov jê bi derkeve. Ger merov an kes û sazî bi nirxa xwe haybibe pirtir wê ji ber wê nirx û cihî ve berxwdanê bike. Dezgeh şûna kesan bigrin, li zagon û yasayê ew birêve werin birin. Di her kar û tiştan de nirxdan ew paristin û mandina wan e.

Xalên me li jor hejmartine dibe hin din jî hebin, xalên bi hez û xêrê ne. Dihêle ew bi vehesî bigerin û bilivin.

04.09.2023an

**Konfiransa ... Dûmahîk**

Rapora SFPZK - Şaxê Almanyayê ji aliyê Gulistan Awaz ve hate xwendin û tê de kar, xebat û çalakiyên saziyê ji 2019an ve û ta 2023yan hate diyar kirin.

Pirs û gengeşe li ser raporê hatin kirin û pişt re ji aliyê Baranê Cûmê û Ferhad Mihemd ve pîrozbahiyên hatibûn şandin, xwendin û guhdar kirin.

Ji Ewrupa:

*Dr. Zeredeşt Haco/ Almanya- Bremen.

*M. Ahmed Beko/ Norwêc.

*M. Mihemed û Berezanî Silêman/Danîmark.

*M. Mihemed Qere Hesen/ Holende.

Ji welêt:

*M. Merwan Berekat.

*M. Dilovanê Deştî.

*M. Îsmaîl Hacî Mûrad.

Piştî bêhinvedan û xwerina firavînê, daxwaza endametiyê ji aliyê beşdaran ve hate kirin.

Di xala hilbijartinê de, komîta rêvebir a borî, mamoste û endamên saziyê beşdar bûn. Şaxê Ewrupa hate damezirandin û komîta rêvebir a şaxê ji heft kesan hate hilbijartin û nav jî ev in:

1 -Arîn Nejar

2- Baranê Cûmê

3- Giryan Seyro

4- Gulistan Awaz

5- Mistefa Henan

6- Serdar Keleş

7- Zîlan Osman

Hêjayî gotinê ye ku Saziya Fêrkirin Û Parastina Zimanê Kurdî li sala 2006an li Sûriyê/ Helebê hate damezirandin û ew yekem sazî ji bo fêrkirin û parastina zimanê Kurdî bû. Li sala 2019an, konfiransa yekê li Ewrupa hate lidarxistin û li wê salê şaxê Almanyayê hate damezirandin, û konfiransa duyem û vê carê şaxê Ewrupa hate damezrandin.



Pêşniyar û biryarên konfiransê:

1- Têkilî bi komele, yekîtî û saziyên Kurdî re werin kirin.

2- Pirtûkên saziyê werin nûkirin.

3-Endamê ku sê civatan bê sedem beşdar nebe, rola xwe tê rawestandin ta konfiransê bê.

4-Nasnameyên endaman hebin.

5- Di konfiransan de xelatkirin hebe.

6- Fêrkirin ne bê pere be.

7-Konfirans her du salan were lidarxistin.

SFPZK- Şaxê Ewrupa
20.08.2023z/2635k

---

**Nivîskarê... Dûmahîk**

sûcê Şikespîr e, ew jî di vir de newekheviyeke polîtîkî heye, ya ku Şikespîre mezin dike, welatê Amerîkayê û ya ku Ehmedê Xanî biçûk dike jî, bêdewltbûna Kurdan e! Divê em vê ferqê bibînin ji ber ku welatê Amerîkayê mezin e ev nayê wê wateyê ku Ehmedê Xanî biçûk e. Welat welat e û huner jî huner e, divê mirov tiştan tevlihev neke.

Heke rojekê balansa dinyayê û hevsengiya polîtîkayê bê guhertin û Kurd xurt bibin, wê çaxê dibe ku Ehmedê Xanî bibe Şikespîr, û Şikespîre jî bibe Ehmedê Xanî. Lê di vir de, divê ev bê dîtin û famkirin: Ramaneke pir çewt e ku serkeftin an jî têkçûna welatan xêr û gunehên wê li ser navê nivîskaran bê qeydikirin. Ev heta niha wiha bû, lê gerek ji niha û şûn ve ne wiha be, ev ne dadmendî ye, ne wijdan e, ne zanistî ye; ne rast e mirov hunereke rind bike bi qurbana siyaseteke xerab, ne jî siyaseteke rind bike bi qurbana hunereke xerab. Gerek dinya û hemû xwendevan vê zanibin ku hunera baş baş e, welat bê wî jî baş e û bi welat be jî baş e; heke ne wiha be, wê çaxê li holê dereweke pir mezin heye, huner tun ye, her kes xwe dixapîne. Heke wiha be, ev ne bi tenê li Ehmedê Xanî neheqî ye, di heman demê de ew li Şikespîr jî neheqî ye: Ji ber ku taliya talî, ya ku tê ecibandin ne wêje û hunera şikespîr e, lê belê, welatê wî ye. Şikespîre û Ehmedê Xanî herduyan ji bivê çîrokê dizanîn heke welatê te hebe û mezin be, tu jî wek nivîskar heyî û mezin î, ji ber vêya bû ku Şikespîre ji qiralan re, ango ji welêt re, dinivîsî, qeyametek şanoyên wî yên Henry û Richard ji ber vê sedemê hene. Ehmedê Xanî ji ber vê sedemê digot ger me hebûya padişahek .

Di vir de pirs ev e: **Nivîskar divê nivîskariyê bike yan welatsaziyê bike?** Nivîskar ne welatsaz e, lê ew jiyansaz e. Heke nivîskar dewletsazîyê bike, ji berê xwe yê esil nivîskariyê dûr dikeve û dibe siyasetmedarek. Avakirina welatekî karê siyasetê ye, ne karê nivîskar e. Îcar heke welatê wî heye û ew li dinyayê mezin kiriye yan jî welatê wî tune ye û ew biçûk kiriye, ev ewqasî ne girîng e ji bo navdarî û pêşketina welatekî pîs bike, ev qelsîtî ye, ev kurisandin û kokirina pênûsê bi xwe ye. Gerek wêjevan nebe parsekê welatan, gerek wêje wêje be, azad û serbixwe be!

# Xelatkirina Xwendekarên Kurd li Rojava û Sûriyê






**Li Helebê**

Roja Yekşemê, 10.09.2023-yan, li taxa Şêx Meqsûd/Heleb, hola Starlayit, rêxistina Helebê ya PYDKS, û bi beşdariya Koma Zozan Ya Folklorê Kurdî, 297 xwendekarên Kurd ên serkeftî/ Bekelorya xelatkirin. Li ser deng, sema û awazên Koma Zozan, xwendekarên serkeftî û malbatên xwe, şevek xweş ku nayê jibîrkirin derbas kirin.

**Li Kobaniyê**

Herweha li Kobaniya berxwedêr, rêxistina PYDKS, bi beşdariya Koma Buhar a folklorê Kurdî 200 xwendekar xelatkirin. Herweha mamosteyê bi navûdeng birêz Hisên Mihemed Elî jî, bo xebat, cefakêşî û dilsoziya wî, bi xwendekaran re hate xelatkirin, û wî gotineke pir bilind û nirxdar ji xwendekar û beşdaran re pêşkêş kir.

**Li Reqayê**

Roja 03.09.2023-yan, li bajarê Reqayê, rêxistina Reqayê ya PYDKS, ahengek lidar xist, 140 xwendekarên serkeftî hatin xelatkirin. Hunermend Ferhad Melle, Mihemed Elûş û Perîşan Kobanî jî, bi mûzîk û stranên xweş ev çalakî xemilandin.

Hêjayî gotinê ye ku gotineke balkêş ji bal rêxistina Reqayê ve hate xwendin, giranî dabû rol û bandora xwendinê di jiyana gelan de, û giringiya guhdanê li nifşê nû çimku ew paşeroja gelê me ne.

**Li Qamişlo jî, Xwendekarên Serkeftî Hatin Xelatkirin**

Roja 15.09.2023-yan, li Navenda Partiya Yekîtî Ya Demoktat a Kurd Li Sûriyê, ji bal Rêxistina Qamişlo ve, bi beşdariya birek heval, dost, malbatên xwendekaran û cîgirê Sekreterê Partiyê birêz Mustefa Meşayix ku gotineke balkêş ji xwendekaran re pêşkêş kir, xwendekarên serkeftî hatin xelatkirin.

Li ber awazên mûzîka Kurdî, sema û dîlana şahiyê geriya, û demeke xweş hate bûrandin.

# Helbestvan Lorî Tildarî jî Ji nav me bar kir (1957- 2023)



Nivîskar û helbestvanê Kurd Lorî Tildarî di sala 1957ê de, li gundê Tildarê jidayîk bûye. Gundê Tildarê bi bajarê Dêrikê ve girêdayî ye, û dikevê navbera Dêrikê û Endîwerê. Wî xwendina xwe ya seretayî li gundê xwe, û ya navendî û lîseyê li dibistana Yûsiv ‘Ezme li bajarê Dêrikê bidawî kiriye. Piştî bawernameya bakaloriya ji wir wergirtiye, wî 3 salan li zankoya Şamê beşê mafnasiyê xwendiye.

Gorbihişt Lorî Tildarî di sala 1975ê de dest bi nivîsandina helbestê kiriye; lê di sala 1979ê de, wî dest bi ristin û hûnandina helbesta Kurdî ya kevineşop (klasîk), hem jî ya nûjen kiriye. Ji bilî helbestê jî, wî gelek lêkolîn derbarê stranên Kurdî û şirovekirina wan bi şêweyekî wêjeyî kirine. Hêjayî gotinê ye ku derdora 800 stranî di 3 pirtûkan de kom kirine.

Tildarî 4 dîwanên helbestê, 3 bi şêweyê klasîk û yek e nûjen, nivîsîne, û ew jî ev in:

1- Halan, bi şêweyê klasîk e û çapkirî ye.

2- Seqlan, bi şêweyê klasîk e.

3- Tildar, bi şêweyê klasîk e.

4- Sefan, helbestên nûjen in.

Her sê dîwanên (Seqlan, Tildar û sefan) ji çapê re amade ne.

**Şahiya 78... Dûmahîk têkoşer û hêja…**

Di destpêkê de, ji bo vexwendnama ji me re, em we pir spas dikin, serkeftinê ji şahîya ku win ji bo 78emîn damezirandina Partiya Demokrata Kurdistan a Îranê pêk tînin dixwazin.

Hevalên têkoşer û delal, Partiya we bi dirêjeya 78 salan bi rêbertiya şehîdên nemir: Qazî Muhamed, Ebdilrehman Qasimlo, Sadiq Şerefkendî … hatiye naskirin li ba me û gelê Kurd li her derê, di asteke bilind de ye, cihê kêfxweşî û serbilindiyê ye.

Em bawer in ku rêjîma kevneperest ya dewleta dagîrker a Îranê bi wan kiryarên hovane û qirêj jî bi ser neket, xebat û tekoşîna tevgera gelê me wê her bi yekrêziya tekoşîna gelê me yê rojhlatî Kurdistan berdewam be.

Em wek P.Y.D.K.S 78 salîya damezirandina Partîya Demokrata Kurdistana Îranê bi dil û can pîroz dikin.

Silav û rêz ji pakrewan û xebatkarên partiya we re.

Yekrêziya partiya we pîroz be, viyana serkeftinê doza Kurd mezin dike!

**Partiya Yekîtî ya Demuqrat a Kurd li Sûryê - Navça Ewropa**

26.08.2023

# Jin û mêr çi ji hevdû dixwazin?

**Melek Murad**

Di jiyana mirovan de, pir cure û rengên dijberiyê hene û serî hildane, di riya pêvajoka mirovan de, nemaze li Rojhilata Navîn, di gelek rewş û waran de rû dane. Wek nimûne: Di warê aborî, çandî, xizanî, şaristanî, civakî, olî… Jin-mêr, nifiş, zanîn, nezanî, û hwd de, bûne kelem. Bêgûman, ev reng û cureyên dijberiyê bûne û dibine sedema ku gelek êş, jan, serpêhatî û pirsgirêkên mezin di jiyana mirovan de peyda dikin. Weha jî, mirov dûrî jiyaneke aram û heyameke wekhevî, aştî, azadî û hevpîvanê dibe! Bi vî awayî, qasnaq li serê mirov teng dibe, û rastî û berpirsiyarî jî binpê dibin!

Çiqas heyf û mixabin ku ew rûdana dijberiyê ya em li vir destnîşan dikin akam û bandora wê li ser pêkhateyên civaka me roj bi roj hewş vedide û gur dibe. Şer û pevçûn, çi di nava yek civakê de (weke civaka Kurdî) be, û çi jî di navbera jin û mêrên pêkhateyên derdora me de be, rû didin. Zor mixabin, şer û pêvçûna di hundirê malan de, ango di navbera jin û mêr de, ji ya di navbera dewletan de mestir û bihêztir e! Bêguman, di encamê de, qurbana herî hêsan û erzan jin û zarok in! Wê lomê jî, hersal bi hezaran jin têne kuştin, revandin, berdan ... û zarok jî sêwî û mişextî dimînin! Ev rewşa bi êş û nedadmend, civaka me ya Kurd jî tê de xwedî par e, û roj bi roj ew asta dijberiyê bilind û mestir dibe, bêtir jî li biyanistanê, û ziyaneke mezin di duhatiya malbatê de bi gelemperî, û malbatên Kurd bi taybetî, ava dike! Ev li hêlekê, û li hêla din jî, jiyana jin û mêr serbintotî hev dibe, û ew di nava nakokî û pirsgirêkan de gêjomêjo dimînin, ew tenê bi hêsanî dikarin hevdu sûcdar û lome bikin! Weke pêşiyên me gotine: Sûc lopaqê berfê ye, kes nake paşila xwe. Ma gelo jiyan wiha çê dibe? Wisa jî gelek pirs xwe di hiş û ramanên mirov de hildidin, gelo sedema dijberiya jin û mêr çi ye? Ew çi ji hevdû dixwazin?

Li gor bîr û baweriya me be, sedem gelek in, lê yên herî bingehîn ev in:



1- Zanyarên olan yên radîkal digel siyasetmedarên mezin, ji bo berjewendiyên xwe, rolên neyînî di civakên me de lîstine û sîstema bavê çêkirine, weha jî cudahî xistine navbera jin û mêr. Wisa jî mêr bûye serwer, serdest, û serbest û jin jî weke herkes dizane bûye ….! Bi vî awayî, mûma jinê vemriye û rola wê jî bincil û binpê bûye!

Dewletên şaristanî û pêşveçûyî wan ji zû ve zagonên xwe li ser riya demokratî, wekheviya jin-mêr û parastina mafên mirovan saz kirine. Lê li Rojhilata Navîn ew rewş weke xwe maye, û jiyana xelkên me di dijberî, şitrês û serêşanê de goplandî - pejmûrde civilandî maye û digevize.

2- Rola perwerdekirinê û çanda civakî ya pûç û vala ku ji sedên salan ve toz û kulxanê li ser pal vedaye, hîn ta rojên îro li ser xakê aktîf maye. Lewre jî, em bivên-nevên li encamên civaka me serûber, yanê çi jin û çî jî mêr, bûne qurban û pir cureyên tund ji cudahiyê di navbera wan de hatine çandin. Wisa jî dijberî û nakokî di jiyana jin û mêr de serî hildane û bûne gastîna şer û cengan!

Li dawiyê, pêwîst e em tev bizanin û bawer bikin ku hemû cudahiyên di navbera jin û mêr de çêkirine, û ya rast û durist jiyan bi hebûna jin û mêr hatiye xemlandin bi wekhevî û pejirandina mafên jinê û rûmetgirtina mêran jî, sal û demsalên mirov xweş û bextewar dibin û heyama hundir malbatan jî dibe bihişt, wê hîngê rêzgirtin û hestên evînê jî di jiyana jin û mêr de cî digirin, ew bi hêsanî şaxvedidin û dergehên jiyana regareg li malê vedibin, zar û zêc jî di heyamek tundirist de mezin dibin.

---

**Şevbuhêreke... Dûmahîk**

kevirekî ku bi çemên dilê te û bi deryayên wê yên germ hatiye şuştin û çêkirin.

Kevirekî, her ku min destê xwe pê kir,

dê peyarêyên Havanayê, kevir bi kevir, bêne bîra min.

Kevirekî ku gelek pinî li ser rûyê wî hene û xalek biçûk jî li ser çenga wî heye.

Kevirekî dibe ku ew gewherek be ku Jose Marti wenda kiribû da ku helbestvanê Kurdistanê wî bibîne û bi xwe re bîne sirgûniya xwe ya li Almanyayê.

Kevirekî ku li kêleka kevirê ku Bayanê ji min re ji Kurdistanê aniye dê cih bibe

û dê her du jî min di tenahî û sirgûniya min ya bêdawî de aram û rihet bikin.

-------

Bonn/ Havana 2023

# Şevbuhêreke helbestî Li Bonnê

Li ser daxwaza xanim Franziska von Borries û dezgeha Mala perwerdeyê- Hînbûna cîhanan (BildungsForum Lernwelten), ku ew xanim rêvebirya tîma wê dezgehê dike, helbestvanê Swîsrî Rolf Doppenberg û yê Kurdistanî Husên Hebeş li bajarê Bonnê li Elmanyayê, di 1ê Îlona 2023yan de, beşdarî şevbihêrkeke helbestê bûn.

Şevbihêrk bi sê zimanan hate lidarxistin: Zimanê Kurdî, zimanê Fransî û zimanê Almanî. Piştî ku xanim Franziska her du helbestvan pêşkêşkirin û dan nasîn, birêz Mihemed Silêman hinekî li tenbûrê xist, û pişt re her du helbestvanan helbestên xwe bi zimanê Kurdî û Frensî xwendin, û Hewa Hebeş jî wergerên helbestan bi zimanê Almanî xwendin.

Herwiha, muzîka Kurdî bi tenbûrê û tiliyên mûzîkjen Mihemed Silêman bi xwendina helbestan re zelal herikî. Di şevbihêrkê de pir Alman û hinek ji dost û hevalan ji civaka Kurdî li Bonnê amadebûn. Bêguman, di şevbihêrkê de felaketa ku bi ser serê Efrîna delal de hetiye jî hat bibîranîn, helbestvan Rolf helbesteke xweş li ser Efrînê xwend û Husên jî helbesteke taybet li ser Efrîna dilê xwe xwend. Di dawiya şevbihêrkê de herdu helbestvanan, Hewa Hebeş û mûzîkvan Mihemed Silêman bersiva pirsên amadebûyan dan, pirsên wan li ser helbest, werger, nivîsandin, ziman, muzîk, hevaltî, biyanîbûn û sirgûniyê bûn. Hêjayî gotinê ye ku şevbihêrk bi kêfxweşiyeke mezin bi dawî bû.

**Newroz - Bonn:**

Eve li jêr, helbesteke, yek ji helbetên kek Hisên ên nû ye:



**Ez ê di demek nêzîk de bêm Havana!**

***Husên M. Hebeş***

Giselle, ez ê di demek nêzîk de bêm Havana,
ma tu tiştekî ji vir dixwazî?
Erê, ez kevirekî, kevirekî piçûk ku bi çem û kaniyên welatê te hatiye şuştin dixwazim!
Bila kevirekî ku mîna çirûskên çavên te û rengê dilê te be.
Kevirekî ku ez xwe li ber eywana deryaya Havanayê pê bibînim
û ji wê eywanê re bêjim ev kevirê helbestvan e û matmayîna sîtavên wî ye.
Ev kevirê helbestvan e û wateya hebûna wî ye.
Ev kevirê helbestvan e ey pêlên bilind û masiyên dilşad.
Ev kevirê helbestvan e ey kefa spî, ey keştiyên ku weke bûkan xwe li ser ava zelal li ba dikin.

Giselle, ey hevala hêja
Niha bêyî ku tu bizanibî, te gelek birîn di dilê min de vekirin!
Birînên ku min dixwest hinekî wan rawestînim û jibîrbikim.
Birînên ku li dilê min dixin û hema hema ji fişarên xwe yên giran, wî dilî hûr hûrî dikin!
Ez ê çawa ji welatê xwe kevirekî ji te re bînim hevalê
û welatê min di her kiliyekê û her çirkekê de tê qirkirin û wêrankirin?
Ez ê çawa ji welatê xwe kevirekî ji te re bînim hevalê
û ev sî sal in ku sirgûnî mîna kevirekî giran li ser sînga min rawestiye
û henasên min bêyî ku bala tu kesî bikişîne, diçikîne?
Ez ê çawa bikaribim ji te re te bînim...?
Lê ka ez hinekî hizir bikim û çareyekê bibînim!
Erê, ez ê ji te re kevirekî biçûk bînim,
kevirekî ku bi çem û kaniyên sirgûniyê hatiye şuştin û çêkirin!
Kevirekî rengîn ku ez ê wî ji çemê Rheinê weke mircanekê derxînim
û bi ser de kevirekî din jî ku bi lêdana dilê min çêbikiriye, bînim!
Erê, ez ê ji te re kevirekî bînim, dê ew jî mîna min, li welatê dûr,
bi sirgûniyê hest bike, lê gava ku di himbêza te de rûne, dê aram bibe
û êşa sirgûniyê di giyan û dilê xwe de sivik bike.

Giselle, min ji bîr kir ku ji te re bibêjim ku hevala min Bayan çûye Kurdistanê
û min jê daxwaz kiriye ku ji min re kevirekî ji welatê min bîne.
Kevirekî weke yê ku min ji vir ji te re aniye,
kevirekî ku ne bi çem û kaniyên sirgûniyê hatiye şuştin û çêkirin,
lê bi yên Kurdistanê hatiye şuştin û çêkirin.
Kevirekî wek ronahiya çavên min û rengê dilê min e.
Kevirekî ku ez ê wek hevalekî dilsoz biparêzim.
Kevirekî ku ez ê baweriya xwe pê bikim û ew jî baweriya xwe bi min bike.
kevirekî ku ji hemû keviran bi nirxtir be,
kevirekî dê di sirgûniyê de her dem hevalê min be!

Giselle, min tiştekî din jî ji bîr kir ku ji te re bibêjim,
min kevirek ji Havanayê bi xwe re aniye, .....

7

# Şopandin di karê perwerdekirin û hînkirinê de

**Nûşîn Bêcirmanî**

Çi Rêvebiriyeke hebe, çar delamtên wê yên sereke hene, ew jî evin: Pilan, rêxistin, serkêşî û şopandin. Di vê mijarê de, ez dê li ser şopandinê rawestim û bi taybetî di perwerde û hînkirinê de.

Bi giştî, pêdivî ye em pênaseyekê ji şopandinê re bidin diyarkirin. Gelo, şopandin ji aliyê ziman ve çi ye? Weke têrm çi ye? Û weke taybetmendiya mijara me, gelo wate û hûrgiliyên wê di perwerdekirin û hînkirinê de, çi ne?

Şopandin, bêjeyeke ji du beşan hatiye avakirin, ew jî ŞOP û ANDIN in. Şop, ji aliyê zimên ve, nîşanên ku ji meşa kesekî yan ajelekî mane. Lê weke têrm, ew tê wateya berhem yan nîşanên ku kesek pê tê bibîranîn. Andin, ji aliyê dî ve, paşbendikek e ku, pê lêkerên gerguhêz ji hin lêkerên negerguhêz têne darîştin; wilo wateya wê ya zimanî ( li pey gerîn û lênerîna ji bo bizane ka çi dike).

Weke di destpêkê de hatiye, şopandin delameta çaremîn e di rêvebirinê de. Gelo danasîna şopandinê çi ye? Şopandina perwerdeyî çi ye?

Şopandin, bi giştî, pêvajoyek organîze ye, ji bo verastkirina bernameyek an çalakiyeke taybet li gorî armancên destnîşankirî û lihevhatî bi nexşeya pilansazkirî re dimeşe. Şopnadin di karê perwerdekirin û hînkirinê de sê beş in:

**1- Şopandina rêxistinî:** Berdevkê dibistanê bi vî beşî radibe, an jî karmendên şopandinê di rêvebiriyên dibistanan de li hereman.

**2-Şopandina perwerdeyî:** Ev beşê şopandinê rêvebiriya dibistanan li herêman an jî desteyên perwerdekirin û hînkirinê, û bi alîkariya komîtên şopandinê yên taybet, pê radibin.

**3- Şopandina mamosteyan ji şagirtan re:** Ev beş mamoste pê radibin, dibe ku rojane, mehane an jî di dawiya werzan de be, ji bo mamoste asta pêşketina hînkirinê û radeya wê, bi gelemperî, an jî di asta her şagirtekî, binirxînin. Ev şopandina mamoste ji şagirtan re bi alîkariya di navbera mamoste, dibistan û malbata şagirt de dibe.

Di vê mijarê de, emê li ser şopandina ku deste an jî rêveberiyên herêman yên perwerdeyî ji dibistan û mamosteyan re pê radibin, şirove bikin. Ew bi xwe jî şopandina rêxistinî an ya perwerdeyî ye.

Şopandina perwerdeyî çi ye ? Gavên wê çi ne? Astengiyên di pêşiya wê de rû didin çi ne?

Şopandina perwerdeyî stûna piştê ye di pêvajoya hînkirin û perwerdeyê de; bêyî wê kar û xebat vala diçin, pispor û zane - bêyî em agadar bibin- winda diçin. Şopandina perwerdeyî piroseya beramberkirina tiştên ku hatine bidestxistin û tiştên ku bidestxistina wan tê pilansazkirin ku bêne cîbicîkirin, ji bo misogerkirina pêşxistina proseya hînkirinê û berjewendiya şagirt, tişta herî sereke be di pêvajoya perwerdeyê de.

**Hêmanên şopandinê :**

1- Danîna pîvanên ku li gor wan karê perwerdekirin û hînkirinê tê pîvan, û encam jî têne destnîşankirin .

2- Şopandina karê tê kirin û pîvana wî.

3- Beramberkirina karê rastîn, li gorî pilansaziya ku jê re hatiye danîn, re.

4- Binavkirina derketina ji rêzê di kar de, û binavkirina sedemên wan derketinên ji rêzê û destnîşankirina çareseriyê ji wan re.

Armancên şopandinê :

1 - Dûrketina ji şaşîtiyan berî ku rû bidin, û eger bûn jî, em nihêlin gur bibin.

2- Berçavkirina şaşîtiyan di pilansazî, rêxistinkirin û hevrêziyê de.

3- Duristkirina pêvajoya standina biryaran.

4- Derbaskirina zehmetiyan û çareserkirina pirsgirêkên ku dikevin pêşiya pêkanînê.

5- Pêşinyarên di derbarê perwerdeya karmendan de pêşve bibin, û kesên ku hewcedarî ku di van bernameyan de beşdar bibin, werin destnîşankirin.

**Astengiyên şopandinê :**

1- Şopandina zêde: Bêguman, mamoste û karmendên perwerdeyê, radeyekê ji şopandinê qebûl dikin, eger ji wilo zêde bibe, wê mamoste vê şopandinê red bikin. Mînak jî ew e dema ku komîtên şopandiniê her roj an her du rojan herin heman dibistanê bo şopandinê.

2- Balkişandina ne di cihê guncaw de.

3- Nehevsengiya di navbera berpirsyariyê û mafan de.

4- Nelayanetî: Ango komîtên şopandinê dema yasayan li ser hin mamosteyan pêk bînin û li ser hine din pêk neyênin.

5- Pêdivî ye ku komîtên şopandinê dûrî nêçîra şaşîtiyan bin ji bo tenê van mamosteyan seza bikin.

**Taybetmendiyên şopînerê baş di perwerdê de çi ne:**

1- Zanîna tam bi yasa û rêzikên birêvebirinê yên pêvajoya perwerdeyî birêkûpêk dikin û giyanê yasayê bicih dikin.

2- Li ser neyîniyan rawestin û ji bo çaserkirina wan zû bixebitin. Bi armanca sezakirina mamosteyan, gerek li pey wan û şaşîtiyan negerin.

3- Bala xwe bidin ser erêniyan û hewl bidin ku wan pêş bixin û piştrast bikin ku berjewendiyên şagirtan û civakê li bala wî bin, ne berjewendiyên wî yên kesane.

4- Pêdivî ye ku taybetmendiyên rêberkî baş li nik wî hebin, ne taybetmendirên rêvebirekî, ji ber di hemî taybetmendiyan de cudahiyek mezin di navbera wan de heye.

5- Divê mamoste ji aliyê zanistî û perwerdeyî ve jêhatî be, da ku bikaribe pirsgirêkan çareser bike û di dema pêşkêşkirina pirsgirêkan de ji berpirsên xwe re gereke rastgo be.

Komîtên şopandina perwerdeyê, gerek xwedî sincên bilind û di biryar û kiryarên xwe de dadmend bin. Çendî ev komît û endamên xwe xwe bibînin rêber û şêwirmend ji mamosteyan re, wilo jî wê ew giyanê hevaltî û berpirsyariyê di navbera mamoste û komîtên şopandinê de peyda bibe, û wisa jî karê perwerdekirinê û hînkirinê wê di asta herî bilind de be.

# Taybetên Zimanê Kurdî Nasnama xwe ye

**Mihemed Qere Hesen**

***(Dumahîka hejmara 156-an)***




Li vir em dikarin sedemên sereke hêştine ziman têvel werin afrandin bijmêrin:

**1- Heyamê zemîngarî (Erdnîgarî).**

**A-** Serma û germahî ev yeka ha baş diyar e, ku netewên li deverên sar dijîn, dengin di zenglorê wan de hene li ba yên li deverên germ dijîn tune ne û vajayê wê jî netewên li deverên germ dijîn, dengin di zenglorên wan de hene li ba yên li deverên sar dijîn tune ne. Wek tîpên ( ظ ض ع.... ) yên devera sar dijîn tune ne (ç, g, v … ) li ba yên li dervera germ dijîn tune ne.

**B-** Hest, nest, rewişt û têgeha ji jiwariya xwe re, ji hev cuda û têvel li ba her neteweke, hêşt guhartin di gewriyê de çêbibe û ziman jî, ji hev cuda bafirin.

**C-** Heyamê çiyayî, deşt, çem û beybûnê.

**D-** Pêwîstiya hevgihêştina civakî, raman, hest, nest û daxwazan ji hev re diyar bikin.

**E-** Têkliyên bazirganî ( gerekiyek aborî ).

**F-** Efsan û ol.

Em tev dizanin netewa Kurd, ji malbata Hindo-Awrupî ye. Ango li gor nêrînên dîrokzanan, ku ev malbat hin Kurdistana niha Îrana niha derketine çûne Hindê, hin jî ber bi Awrupa çûne û di serdema qermîtkê de dîsa vegerîne Asiya biçûk. Ji ber vê di navbera zimanê van netewan de bêjeyên hevpişk pir in û şêweyê nivîsandinê û stîlên xwe nîzîkî hev dibin.

Ev tiştên hevpişk di nava zimanê netewên Hindo-Awrupî û zimanê Kurdî de ji hêlekê ve, û ji hêla din ve jî hevpişkî û bengzemîşiya di navbera zimanên kevnar, somerî û sênsêkrîtî û Kurdî de, ji hêla şêweyê ristina stîla hevokan de hene, û vaca û rêbaza ramankirina hevpişk jî nîşan û xuya dike. Ango şêweyê ramankirinê jî nîzîkî hev in. Merv bawer dike, ku di navbera van zimanan û netewan de mûyekî hevgirêdanê heye.

**2-** Wekî zaniyaran dane zanîn, ku Arî ew kesên ronî û arperest bûn, ciyê lê dijiyan di navbera Êraniya Kevin û Belîxê de bû. Ango ev zimanên Êraniya Kevin, somrî û sênsêkrîtî, li ber kanî û rûbarên Ferêt, Declê û şaxên wan û yên Kinc û Xancê û devrên çiyayên bilind ên di navbera çiyayên Zagros û Hindê de afrîne, û li çarîka cîhanê belavbûne. Ji wan zaravek di berqef û qelişên çiyayê Kurdistanê de maye. Divê îro ji nû ve li ber rûbar, kanî û deştên avî were çandin, ku fîdankên nûjeniya zimanê Kurdî şînbibin.

**4- Taybetiya zimanê Kurdî.**

Ev navnîşan pir mezin û pêwîst e, jê re lêkolînên fere grek in. Lê li gor pêzaniya xwe ezê hin xalan bijmêrim.

**A-**Ji malbata zimanên Hindo- Awrupiye.

**B-**Li ser zemîna jê bi derketî û afiriy dijî.

**C-**Netewa Kurdî ji yên din cuda dike.

**D-**Genca xwe ya devkî pirtirî ya nivisandiye. Ango zimanê Kurdî, li ser zar û zimanan di dîrokê de berdewam kiriye û maye. Nebû zimanê dewlet û Împretoriyên temen dirêj, û pê şaristaniya nûjen û berçav ava nebûye.

**Î-** Pê dîroka rewşebîriya Kurdî hatî nivîsandin.

**G-** Bêjeyên xwe mîna yên latînî, bi kîtan, û pêşkît û paşkîtan tên darijtin( sade, pêkhatî, hevedudanî, …). Ango zimanekî kesandiy.

**H-** Her bêjek ramanekê diyar dike, ne bi hevoka û biwêjeyê diyar dibe. Hin ziman hene bi hevok û biwêjeyan ramanê diyar dikin wek malbata zimanên Orel-Eltayî.

**I-** Têkariya zimanên din pir lê nebûne, wê jî hêşt netê pişaftin û windakirin; tevî dîroka xwe devkî dirêjtirî ya nivîsikî ye û pir daneserên dêriskirinê bi ser de hatine, xwe parastiye.

**J-** Ji ber zimanê Kurdî têklî û tevheviya xwe bi zimanên din re hindik bûn, pak û jing maye.

**K-** Bi netwa xwe re çarperçeye

**L-** Pirtirî alfebeyekê pê tê nivîsndin.

**S-** Şaristaniya nûjen pê nehatî avakirin, ji ber wê ferhenga xwe ji zarawên (têrim)sazeyî û zinstî tune ye.

**T-** Ritm û sazê xwe ji zimanên din têvele.

**U-** Mirov dikare zimanê Kurdî, bi zimanê çiya, çem deştan bi nav bike. Ango bi zimanê kesk bi nav bike.

**5- Ziman û xweyetiya netewa Kurd.**

Xweyetiya Kurdî: Ew hest, nest, lav û ramana mervê kurd dinmîne, û taybetên wî rojane bi kartîne û xuya dike. Ango nasname ya teşeyî û razberîb bi tevahî şanî didin û wê (nasnamê) ji heyna xwe ya civakî werdigre.

Gava peyva Kurdî hatî afrandin, ne bes tiştan ji hev cuda bike û nav û karê wan xuya bike. Lê di xwe de hêzin razberî mezin jî hilgrtiye, wek (raman, çêj, hest, nest, daxwaz û saz vê re derûn û rewişta netewa Kurd hatî histiran û taybetiya xwe standiye. Lewre netewa Kurd wek dijî dirame û dipeyîve, û wek dipeyîve weha jî dirame. Ango jiwariya ziman û civaka Kurdî ayneya ramana xwe ye. Wek Can cozêf dibêje:››Karanîna şanên zimên têkliyên civakê diterixînin; ji ber vê nasnama civakî bi xwe di zimên de ye››.

Ziman bi xwe jiwarî û bingehe, derûna merv li ser ava dibe. Merv bi dan û standina bi hawîra xwe re hînî zimên dibe û

….. 11

**Taybetên... Dûmahîk**

ji hêla derûnî vet tê histran. Bi gotinek dî ziman û agahî di mêjiyê zariyan de berî bibe nehatî tomarkirin. Lê di paş bûnê re tê tomarkirin; ji ber ku mêjiyê merv taybeta tomarkirinê li têde û ba heye.

Li vir em dikarin bêjin, ku mervê Kurd xwe çawa yek ji netewê dibîne? Gava ev kes li dîroka xwe ya şanberî û razberî mêze dike û li bûyerên wê yên têvel vedigere, tê de serfraziyê, mêrantiyê, rewiştên hêja û gencan di hemî aliyan de dibîne; rûmeta heyîna xwe jê werdigre û xwe di ber de berpirsiyar dibîne, rewşa xwe dinirxîne ku îro çawa dijî û delamet û armanc li bendêne. Li vir xweyetî û rola xwe nas dike .

**- Ziman û rewşenbîriya Kurdî.**

Di roja zimanê Kurdî afiriye de, vê re kaniya zanînê der bûye; ji ber vê kelepûra xwe gelek dewlemend e. Tijî evsan û dastan in, ji kûraniya rewşên têvel (aborî, rêzanî…) ên civaka Kurd dipêvajoya dîrokê de hatine nîşandan. Yek ji taybeta kelepûra Kurd destanên xwe yên devkî pir in( Ferhad û şêrîn, Mem û Zîn, Wês û Ramîn, Usib û Zelîxe, Las û Xezal, Û Mehmod û Marzigan,…) .

Kelepûra stiranê û metelokan jî dîroka rewşenbîriya Kurdî tê de xewkiriye, divê ji nuh ve were vejîn. Ji hêla kelepûra nivîsandina bi zimanê Kurdî ve, û bi teşeyên tîpên têvel, vedigere berî zayînê, dema Împretoya Mîtan, Horî û Mîdiya, tevî ne bi vî navî bûn, lê pê hatî nivîsandin kar û barê dewletê û dînên ‹›olên›› xwe pê dimeşandin, ra gihane van berhemên dawî yên bi tîpên erebî hatine nivîsandin. Di Baba Roxê Hemezanî de bigir ta nivîsandina êsta li Kurdistana başûr û rojhilat.

Gava Mîr Celadet tîpên latînî danîne, vê re berê nivîsandinê rast bir. Îro piraniya gelê Kurd wan bi kartînin; lê li rex wê girêka yek nivîsandinê çêbû.

Ger em Kurd bixwazin zimanê me zindî bimîne, pir pêwîste em bikin zimanê berhemdar. Ango divê hemî Kurd hînê bibin û berhemên giyanî (wêje, felsefe, û civakî…) û şanberî pê werin afirandin. Di rewşa (sazeyê û bazarê…) keve, taku li nav Kurd û ne Kurdan belav bibe; ra sedemên mandinê jê re çêbibin ku bibe yê dayînê û berdewamiyê.

Zimanê Kurdî îro ne bes bûye nasname, jê re bûye ayne û giyan. Gava mervê Kurd motika û dilê rewşenbîriya xwe binase, serest li zimanê xwe vedigere, ji vê mervê Kurd radike, ku parek ji raman û hişê netewa xwe di zimên de ye. Lê yên din jî di hunera wêneyî, semayî û mozîkê de ye.

**Ziman û raman**

Ziman alavek alîkare bi ramanê re, û beşeke ji ramanê di zimên de ye, têklîk hevpişk (cedelî) bi hev re hey, her yek ya din bi pêş dixe. Wîlyem Jevens dibêje:»Ziman bilî yên diramin û dipeyvin tune ye.»û hin zaniyar jî dibêjin:»Ziman ew raman e» Bi alîkariya zimên raman kûr û fere dibe. Bi alav û nîşandekên wî ramangîr dibe, nêrîn, hîş û sîberên xwe ronahî dike û dide nas kirin. Merev dikare bibêje, ku ziman kode(şan e) ji ramanê ye û jê re ye.

**- Delametên zimên.**

Ger merv li delametên zimên bigere, dawî nînin, ji ber ku gava tu serê xwe ku ve rakî, ku de bilivî û çibikî di jiyan de bi zimên e. Ziman di rola xwe ya civakî de kesan bi dan û stanê dighînin hev û bi hev re têklidar dibin, çi di têkliyên şanberî de (kirîn, firotan, avakirin…) û çi jî di têkliyên razberî de bin(hest, nest, hêvî, daxwaz,…).

Gava mervê Kurd bi zimanê xwe dipeyîve, tavilê di sekolociya wî de hevgirêdanek çê dibe. Ew di rêya xwînkelandina bi ser hev de û bi yek nûsê re têdigehe û bi hev re hevjiyanek taybet û xweş divên.

Gava zimanê Kurdî di hemî aliyên jînê de ciyê xwe bigre, ji zimanê devkî hilgere yê zanistî wê paya netewa Kurd, di nav netewên cîhanê de xuya bike û nêşan bide.

Lê niha zimanê înglîzî wek nimêne em bêjin, çiqas berhemdar e û li cîhanê belav bûye, û bûye zimanê sereke, tevî wê nikane şûna zimanên netewan li cîhanê bigre; ji ber wê her zimanekî netewî taybet û dîroka xwe rewşenbîrî heye, û di hûrik û mûrikên xwe de, di delameta xwe ye hundirî de rewşa netewane û ciyê nîgara wane, û gencên tijî bayex û sîpolên mervane .

Merv dikare bêje, îro cîhan bûye gundekî bi çûk, zimanên serek bûne yên zanistî, aboriyê û yên têkliya konevanî di cîhanî de, yên din jî wek zarawe di vî gundî bi çûk de bi kartên û hevgirêdaneke cîhanî bi hev re çêdibin. Lê gava zimanek dêris dibe, vê re genc in ji ronahiya giyanê merv ziya dibe û vedimire.

**13- mîn sal... Dûmahîk**

ziman. Mamoste Mistefa Meşayîx li ser rola nemir di avakirina rikberiyeke niştimanî Sûrî baş axivî, nemaza damezirandina “Danezana Şamê”.

Komîta Çand û Ragihandinê ya Navçeya Qamişlo û Tirbespiyê, di êvara heman rojê de, semînarek li Navenda partiyê li Qamişlo lidar xist. Di vê semînarê de, mamosteyê Rêzdar Newafê Bişar (Bavê Dara) bi berferehî li ser jiyana nemir İsmayîl Umer û helwestên wî derbarê çarenûnsa miletê Sûriyê bi tevayî, û ya miletê Kurd û pêwîstiya çareserkirina doza Kurdî bi taybet, axivî. Di dawıya vê çalakiyê de,



mamoste Yûsiv Yaqûb spasiya beşdaran kir.

# Bi êrîşeke asîmanî ya Turkiyê 29 endamên Asayişê Jiyana xwe ji dest dan!

**29 Şehîdên Hêzên Ewlekariya Hundirîn - 08.10.2023an**



Di çarçewa belavkirina teror û mirinê li bakur û rohilatê Sûriyê, li roja 8-ê meha Çiriya Pêşîn 2023Z, balefirên Turkiyê yên bêajovan hin navend û bingehên aborî û xizmetguzariyê li devera Dêrika Hemko armanc kirin ku akademiya Asayişê yek ji wan bû. Di encama vê êrîşa xwîndara hovane de, 29 endamên Asayişê jiyana xe ji dest dan û 28 ên din jî birîndar bûn!

Bi vê boneya dilêş, Rêveberiya Xweser biryar bi kişandina şînê 3 rojan li seranserî deverên Xweseriyê wergirt.

Cihê pakrewanan bihuşt be, serê gelê me sax be û cansaxî û aramî ji birîndaran re!

## 13-mîn salvegera koça dawîn a Ismayîl Umer Serokê Partiya Yekîtî Ya Demokrat a Kurd Li sûriyê

Roja Çarşemê 18ê Cotmeha 2635K/2023Z, û bi bîranîna 13mîn salvegera koça dawî ya serokê partiyê gorbihişt İsmayîl Umer (Bavê Şiyar), hevalên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ) – rêxistinên Cizîrê û bi beşdariya




hijmarek ji dostan, du çalakî lidar xistin. Danê berî Nîvro, wan sredana gora nemir Bavê Şiyar li gundê Qereqoyê kir. Li wir, cîgirê sekreterê partiyê rêzdar Mistefa Meşayîx kurtegotinek pêşkêş kir. Di axaftina xwe de rêzdar Meşayîx hin helwest û bîr û boçûnên xebatkar Bavê Şiyar derbarê yekrêziya tevgera Kurdî û çareserkirina doza miletê Kurd anîne

..... 11